# Veguhestina bankî ya perepereyên kaxizî û sikeyê didome




SVERIGES RIKSBANK

# Pereyên kaxizî û sikeyên Swêdê



# Veguhestina pereyên kaxizî û sikeyan didome

Riksbank`ê sala 2015 dest bi derxistina pereyên kaxizî yên 20, 50, 200 û 1000 kronî yên teze kir Li Cotmehê pereyên kaxizî yên 100 û 500 kronî yên teze dê werin raberkirin. Em ê her viha sikeyên 1, 2 û 5 kronî yên teze raber bikin. Pereyên kaxizî yên teze taybetmendiyên xwe yên ewlehiyê yên teze hene ku li hemberî sextekariyê baş tên parastin û sikeyên biçûktir, dê siviktir û bêyî Nîkilê bin.

Di demeke diyarkirî da, wê him pereyên kaxizî û sikeyên niha û him jî yên teze di bazarê da hebin. Pereyên kaxizî û sikeyên niha dê hêdî hêdî bêhitbar bin (Ji bilî sikeya 10 kronî ku dê neyê guhertin).
Ji ber viya jibo girtina rê li ber hebûna pereyên kaxizî û sikeyên bêhitbar li mal, di dema herî lezgîn da wan ji mal derxinin an veguhezînin hesaba xwe ya bankê.

Ji kerema xwe bi bîr bixin ku renge wergirtina hejmareke zêde ya sikeyan jibo firoşgeh û bankan karekî dijwar be, bi taybet dema ku em digihêjin qonaxa dawiyê ya veguehstinê. Nehêlin ku dem derbas bibe û bikevin derengiyê



Stefan Ïngûes (Stefan Ingves)
Serokê Riksbank`ê
Îlona (Septambra) 2016`an

**Li malpera myntkartan.se bigerin**
Gelo hejmareke zêde ya sikeyan li ber destê we ne? "Myntkartan" nexşeyek e ku ji we ra nîşan dide ku hûn li kîjan derê dikarin wan sermayeguaziyê bikin.

myntkartan.se



# Pereyên kaxizî (Banknot) yên teze li Cotmeha (October`a) 2016`an

Di Cotmeha 2016`an da, dê Riksbank xebata belavkirina pereyên kaxizî yên 100 û 500 kronî yên teze bi rûvek û neqş û nigarên teze dest pê bike. Renge demek derbas bibe ku hûn bikarin pereyên kaxizî yên teze bibînin, ji ber ku pereyên kaxizî yên 100 û 500 kronî yên niha jî dê heya demekê li bazarê hebin.




**Nîqaşa ser rûyê banknotê (Rû)**
Lîstikvana jin xanima Grîta Garbo (Greta Garbo)




**Nîqaşa ser pişta banknotê (Pişt)**
Stokholm (Stockholm), Ciyê ku Grîta Garbo têda mezin bû




**Nîqaşa ser rûyê banknotê (Rû)**
Stranbêjê Opêrayê, Bîrgît Nîlson (Birgit Nilson)




**Nîqaşa ser pişta banknotê (Pişt)**
Skane (Skåne), Ciyê ku Bîrgît Nîlson têda mezin bû

# Sikeyên teze li Cotmeha 2016`an (October`a 2016`an) da

Li Cotmeha 2016`an da, dê Riksbank dest bi belavkirina sikeyên 1, 2 û 5 kronî yên teze bike. Sikeyên 10 kronî wê neyên guhertin Renge heta heyamekê hûn nekarin pereyên hûr (Sike) ên teze li bazarê bibînin, ji ber ku sikeyên niha jî dê heya demekê li bazarê hebin.

Sikeyên teze bêyî Nîkilê, siviktir û biçûktir ji sikeyên niha ne.



Rûyê sikeya 1 kronî (Rû)



Pişta sikeya 1 kronî (Pişt)



Rûyê sikeya 2 kronî (Rû)



Piûta sikeya 2 kronî (Pişt)



Rûyê sikeya 5 kronî (Rû)



Pişta sikeya 5 kronî (Pişt)



Sikeya 10 kronî dê neyê guhertin.

# Pereyên kaxizî ku dê piştî 30`ê Hezîrana (Juen) 2017`an bêhitbar bin.

Pereyên kaxizî yên 100 û 500 kronî yên niha wê tenê heta roja 30`ê Hezîrana 2017`an bên bikaranîn.

## Demên girîng

- 30`ê Hezîrana 2017: `an dawîn roj e ku hûn dikarin van pereyên kaxizî jibo raberkirinê bi kar bînin.
- 30`ê hezîrana 2018: `an dawîn roj e ku hûn dikarin van pereyên kaxizî veguhezînin hesaba xwe ya bankeyê.







## Nehêlin gelek direng be!

Renge bank û firoşgeh li warê qebûlkirna pereyên kaxizî bisînor bin. Eger qaseke zêde ya pereyên kaxizî jibo veguehstinê li ber destê we heye, jibo wergirtina zanyariyên zêdetir ji kerema xwe ligel banka xwe peywendiyên bigirin.

Piştî 30`ê Hezîrana 2018`an, Riksbank dikare pereyên kaxizî yên bêhitbar piştî kêmkirina xercên idarî bi qasî 100 kronî bikire.

## Çima bank neçar e ku hin pirsan bipirse?

Dema ku hûn dikarin pereyekî veguhezînin hesaba xwe ya bankê an danûstandineke din pêk bînin, divê hûn amade bin ku bersiva hin pirsan li vî warî da bidin ku gelo ev pereya ji ku hatiye û pêwsît e ku belgeyên bawerpêkirî raber bikin. Li hinek babetan, gengaz e (mimkin e) bank bixwaze girêbest, peymaname, girtek yan belgeyên din bibîne daku piştrast be ka ev pere ji kû hatîye. Ev mijara têkildarî qanûna kiryarên li hemberî neçêbikaranîna dirêv (paqijkirina nerewa ya dirêv) û dabînkirina malî ya têrorîsmê ye ku yek ji pêwîstiyên wê, ev e ku bank erkdar in li bara çavkaniya ispartiyên malî zanyariyê bi dest bixin.

Ev hilkolandin divê heta wê çaxê ku ti şik û guman li bara sûcdarbûnê tine jî, pêk were. Armanca vê qanûnê girtina rê li ber bikaranîna bank û kompaniyên malî jibo neçêbikaranîna pereyê (paqijkirina nerewa ya pereyê) ye, yanê pereyê hasil ji çalakiyên sûcdariyê ku dibe pereyê ku dikare li hesabeke bankî were bikaranîn. Ev qanûn û biryar li bara gişt kompaniyên malî li Yekîtiya Ewropayê da tên sepandin.

Riksbank jî qanûna kiryarên li hemberî paqijkirina nerewa ya dirêv dişopîne.

# Sike wê piştî 30`ê Hezîrana 2017`an bêhitbar bin.

Sikeyên 1 û 5 kronî yên niha wek hertim heta roja 30`ê Hezîrana 2017`an tên bikaranîn.

Ev yeka li bara sikeyên 2 kronî yên berê jî – eger di destê we da hebin – visa ye. Herçend ku danûstandina tev sikeyên 2 kronî yên berê dikare dijwar be; Ji ber ku roja îro ewna gelek kêm jibo danûstandin û kirrîn-firotinê tên bikaranîn.

## Demên girîng

- Roja 30`ê Hezîrana 2017: `an dawîn roj e ku hûn dikarin van sikeyan jibo danûstandinê bi kar bînin.
- 31`ê tebaxa 2017: `an dawîn roj e ku hûn dikarin van sikeyan veguhezînin hesaba xwe ya bankeyê.


1 kron


2 kron


5 kron

*Balder bin ku ne tenê sikeyên ku wêneya wan li jortir da hatiye, belkê gişt sikeyên 1, 2 û 5 kronî yên niha dê hitbara xwe ji dest bidin (Dê bêhitbar bin)*

## Nehêlin gelek direng be!

Renge wergirtina hejmareke zêde ya sikeyan jibo bank û firoşgehan karekî dijwar ber, bi taybet dema ku em nêzikî qonaxa dawiyê ya veguehstina bankî dibin. Zanyariyên zêdetir ji bank an firoşgehên nêzikî xwe werbigirin.

**Piştî 31`ê Tebaxa 2017`an** êdî dê veguehstina bo pereyên nû jibo sikeyên bêhitbar li Riksbank an bankên din pêkan nebe.

---

## Kîjan sikeyî nayên guhertin? (Kîjan sikeyî dewsa wan tiştek nayê?)

Sikeyên 10 kronî û sikeyên têkildarî cejn û bîreweriyê dê heta sala 2017`an hitbara xwe ji dest nedin. Gişt sikeyên öre`ê berî viya hitbara xwe ji dest dane  û hûn nikarin wan jibo raberkirin an veguehstina bo pereyên nû li bankan an Riksbank`ê bi kar bînin.

# Jibo ku dilniya bin pereyê kaxizî esl û resen e, ji kerema xwe wê bitewînin.

Pereyên kaxizî yên nû taybetmendiyên xwe yên ewlehîyê  yên nû hene ku dibin sebeb sextekirna wan dijwartir bibe. Eger hûn pereyên kaxizî (Banknot) bitewînin an biçemînin, hûn dikarin bibînin ka esl û resen e an na.




**Bendika ewlehiyê**

Bendika stûnî Hin dîmen li nav pencere û şebekeyan hene ku dema hûn pereyê kaxizî xar dikin (an diçemînin), dilivin û neqş û nigara wan nava ``KR`` û taceke siltantiyê diguhere. Renge şêwaza cihbûna bendikan li pereyên kaxizî yên cûrbicûr ciyawaz be.

**Wêneya ku rengê wê diguhere**

Wêneya ku dema xarkirina pereyê kaxizî, rengê wê hêdî hêdî navbera zêrîn û kesk da diguhere. Wêne girêdayî bi kesek e ku wêneya wî/ê li ser pereyê kaxizî hatiye neqişandin; Her viha nîşana yekîneya pereyê kaxizî ye.



# Demên girîng

**Cotmeha (October`a) 2015`an**



**Cotmeha (October`a) 2016`an**



1 kron 2kron 5kron

**2015 2016 2017**

**Bêhitbar piştî 30`ê Hezîrana (Juen) 2016`an**



**Bêhitbar piştî 30`ê Hezîrana (Juen) 2017`an**



1 kron 2 kron 5 kron

Eger hîn jî ev pereyên kaxizî li ber destê we hene, Riksbank dikare wan li berdêla dayîna xercê cihanînê bi qasî 100 kronên Swêdê veguhezînin pereyên nû.

# Li bara Riksbank`ê



Riksbank Banka Navendî ya Swêdê ye. Em pereyên kaxizî û sikeyên Swêdê belav dikin. Her viha em garantî dikin ku pere nirx û qîmeta xwe diparêze û dayîna dirêv dê bi awayê ewleh û kêrhatî pêk were.



Zanyariyên zêdetir:

- **Malper**: riksbank.se/checkyourmoney
- **Bername**: Li firoşgeha bernameyên (application) mobayla xwe li bernameya ``Kolla pengarna`` yê bigere



Zanyariyên zêdetir bi zimanê Swêdî

- **Facebook**: facebook.com/kollapengarna
- **Coinmap**: myntkartan.se
- **Bibîrxistina demên girîng:** Nivîsa ` riksbanken start` wek kurtepeyam bişîne hejmara 71120`ê







**Veguhestina bankî ya pereyên kaxizî û sikeyan didome.**

| | | |
|---|---|---|
| Shqip | Kurdîya kurmancî | Română |
| العربية | سۆرانی | Русский |
| Surayt | Julevsámegiella | Srpski |
| Bosanski | Meänkieli | Soomaali |
| English | Davvisámegiella | Español |
| Suomi | فارسی | Åarjelsaemien |
| Français | Polski | ܣܘܪܝܝܐ/ܐܪܡܝܐ |
| ייִדיש | Arli | ไทย |
| 中文 | Kalderaš | Türkçe |
| Hrvatski | Kálo | Deutsch |

**riksbank.se/languages**

SVERIGES RIKSBANK